**Bultena heftane**

**13/1/2024**

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

# Wêneyê Mamosta Cîhan Teha li ber Koçka Spî hate danîn

Wêneyê Mamosta û xwepêşander Cîhan Teha li ber deriyê Koçka Spî ya Washingtonê li kêleka wêneyên Şêrwan Şêrwanî û Serdeşt Osman hate danîn.

https://rojnews.news/ku/?p=300427

Çavkanî:ROJNEWS




# TJA: Ji bo azadiya tevahî girtiyên siyasî divê kampanyayek kurevî bê organîzekirin

TJA, derbarê konferansa “Zincîra Bêdengiyê: Hilweşandina Dîwarên li Dora Girtiyên Jin ên Siyasî” de diyarkirin ku divê kampanyayek kurevî ji bo bidestxistina azadiya tevahiya girtiyên siyasî yên jin bê organîzekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tja-dive-kampanyayek-gerduni-ji-bo-azadiya-tevahi-girtiyen-siyasi-be-organize-kirin-43167

Çavkanî:JINHA



# Jina şoreşger a ku jiyana xwe ji bo rizgariya mirovahiyê feda kirî: Rosa Luksemburg

Jina şoreşger û têkoşînvan Rosa Luksemburg beriya 105 salan îro li kolanên Berlînê hate qetilkirin. Rosa di tevahiya jiyana xwe de ji bo maf û rizgariya mirovahiyê têkoşîn kir û her tiştî feda kir. Di kampanya û axaftinên xwe de bandor li guhdarên xwe dikir û bi awayekî radîkal ji bo mafên jinan û civakê têkoşîn kir, ji bo vê jî bi dehan caran hate girtin û zîndanîkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=300453

Çavkanî:ROJNEWS




# Li Berlînê polîsan êrişî bîranîna Rosa Luxemburg kir: 16 kes birîndar bûn

Polîsan êrişî çalakiya bibîranînê ya salvegera mirina damezrînerên Partiya Komunîst a Elmanyayê Rosa Luxemburg û Karl Leibeknecht ya li paytexta Elmanya Berlînê hat pêkanîn kir. Di êrişê de 16 çalakger birîndar bûn.

https://rojnews.news/ku/?p=300642

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Borj Cedria jin bi meşa xwezayê tendirûstiya xwe di parêzin

Jinên li bajarokê Borj Cedria a Tûnisê beşdarî kulubên meşê bûne, tendirûstiya xwe a beden û zîhnî bi hêz dikin.

https://jinhaagency.com/ku/werzis/li-borj-cedria-jin-bi-mesa-xwezaye-tendirustiya-xwe-di-parezin-43125

Çavkanî:JINHA



## Parêzvana mafê mirovan Bûşra Al-Şatwanî jiyana xwe ji dest da

Parêzvana mafê mirovan a Mexrîbê Bûşra Al-Şatwanî li nexweşxaneyek taybat a li bajarê Agadir ku lê tedawî didît jiyana xwe ji dest da.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezvana-mafe-mirovan-busra-al-Satwani-jiyana-xwe-ji-dest-da-43124

Çavkanî:JINHA



## Ji bo jinên Amazigh proje tên pêşxistin

Amazigh, gelê kevnar ê Mexribê ye, nikare xwe di gelek saziyên giştî yên wekî dadgehan de îfade bike. Jinên ku piştgiriya hiqûqî didin jinên Amazigh, armanc dikin ku dawî li cudakariya heyî bînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-jinen-amazigh-proje-ten-pesxistin-43121

Çavkanî:JINHA



## ‘Pêwîst e rêxistinên jinan xwe ji nû ve bikin’

Rojnamevan Sazyan Talib diyar kir ku hejmarek berbiçav a rêxistinên jinan heye, lê pêdîvî xwe ji nû ve rêxistin kirinê heye û divê çalakî li taxan di nav civakê de bê meşandin û xwe bigihînin jinên di nav malê de hatine girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pewist-e-rexistinen-jinan-xwe-ji-nu-ve-bikin-43119



## Kiryarê tecawiza li dijî jina astengdara zihnî nehat girtin

Jina ku ji aliyê zihnî ve astengdar bû piştî ji aliyê Hakan E. ve rastî tecawizê hat ducanî ma û zarokê wê ya ku çêbû girtin bin parastinê. Der barê Hakan E. de biryara darizandina bi awayê serbest hat dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/kiryare-tecawiza-li-diji-jina-astengdara-zihni-nehat-girtin-43118




## Rojnamegerên nûçeya Jîna Emînî çêkiribûn hatin berdan

NAVENDA NÛÇEYAN - Rojnamegerên ku nûçeya qetilkirina Jîna Emînî çêkiribûn, Nîlufer Hamedî û Îlahhe Muhammed, 10 mîlyar tümen kefalet dan û piştî 17 mehan şûnde hatin berdan.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225043

Çavkanî:JINNEWS




# [Jina 81 salî ku nikare bimeşe kirin endama AKP’ê]

MÊRDÎN - Jina 81 salî ya li Qoserê dijî, nexweşa alzheîmerê ye û bi zor dimeşe, Şemsî Erol ku endama HDP’ê bû diyar kir kir ku neviyên wê li e-devletê mêze kirine û derketiye holê ku di 2022’an de ew kirine endama AKP’î. Şemsî bertek nîşanê rewşê da û got wê serî li ÎHD’ê bide.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224999

Çavkanî:JINNEWS




# [‘Li Xezayê her roj 180 jin di şertê dermirovî de zarok tînin’]

Xaça Sor a Filistinê diyarkir ku li Xezayê her roj 180 jin di şert û mercên dermirovî zarok tînin û da zanîn ku Îsrail xwegihandina ambulansan asteng dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-xezaye-her-roj-180-jin-di-serte-derveyi-mirovi-diwelidin-43138

Çavkanî:JINHA



## Zarokên keç ên xwendina wan tê astengkirin li malan perwerde dibînin

Mamosteyên jin ên ku li hember polîtîkayên dijminê jin ên Talîbanê berxwe didin, li malan perwerde didin zarokên keç ên ku xwendina wan tê astengkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zaroken-kec-en-xwendina-wan-te-astengkirin-li-malan-perwerde-dibinin-43137

Çavkanî:JINHA



## Serî li zextan netewand: Bû yekem memûra tevgera balafir a Lîbyayê

Yekemîn memûra tevgera balafiran a Lîbyayê Karîma Al-Hamrî diyar kir ku tevî zextên civakî pîşeya ku tê gotin 'karê mêr e' hilbijartiye û got: "Min karî ku ez ji heqê vê fikra dûr aqil derbikevim, min di karê xwe de jêhatîbûna xwe nîşan da."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/seri-li-zextan-netewand-bu-yekem-memura-tevgera-balafir-a-libyaye-43136

Çavkanî:JINHA




## Tiştên ku dozgerên jin di dadweriya Lubnanê de dijîn bûn pirtûk

Lêkolîner Azza Al-Haj Sulêman ya di amadekirina pirtûka bi navê “Di Dadweriyê De Jinên Lubnanî: Bihêzkirina Serwerî û Îhmalkirina Marjan” de cih girtiye bal kişand li ser roja dadwerên jin di pêkanîna edaletê de.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tisten-ku-dozgeren-jin-di-dadweriya-lubnane-de-dijin-bun-pirtuk-43134

Çavkanî:JINHA



## Li Hewlêrê bi tîzavê êrişî jinekê hate kirin

Li Hewlêrê li ber derê mala wê, bi tîzavê (asit) êrişî jinekê kirin, jina piranî ji rûyê xwe birîndar bû rakirin nexweşxaneyê. Ji duh ve li ser bûyerê ti kes nehatiye binçavkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=300323,

Çavkanî:ROJNEWS



## Li ber Girtîgeha Sîncanê ji bo Gultan Kişanak bang

ENQERE -Jinên ku piştî bêhnvedana ji doza Kobanê daxuyanî dan diyar kirin ku têkoşîna Gultan Kişanak têkoşîna wan bi xwe ye. Hevseroka Giştî ya DEM Partiyê Tûlay Hatîmogûllarî got, "Erê, em ê jin bi hilweşandina desthilatdariya faşîst kariyera xwe ya herî mezin bikin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225090

Çavkanî:JINNEWS




## Jinên Wanê şaredariyeke demokratîk xwestin

WAN – Jinên ku tevlî pêşhilbijartina Rêya Armûşê bûn, anîn ziman ku ew dixwazin bajarê xwe û bi xwe rêve bibin û gotin ew şaredariyeke demokratîk dixwazin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225065

Çavkanî:JINNEWS



## Rojeva 2024’an a Şanoya Bajar a Amedê tije ye

AMED - Lîstikvana Şanoya Bajar a Amedê Berfîn Emektar der barê xebatên di 2024’an de wê bimeşînin û çi di rojeva wan de ye axivî û anî ziman ku ew ji rojeva gel serbixwe tevnagerin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225057

Çavkanî:JINNEWS



## Di Radyoya Êrîvanê de dengê Fatma Îsa

NAVENDA NÛÇEYAN - Fatma Îsa bi yek carê di Radyoya Êrîvanê de distrê û careke din jî nastrê. Lê ev car têra wê dike ku ji aliyê hemû kurdan ve bê nasîn. Fatma bi 5 kilamên qeydkirî îro di nav nemiran cihê xwe digire.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225055

Çavkanî:JINNEWS



## Nexşên Dêrsîmê li bêrîkan tên kirin

DÊRSÎM - Gulfîraz Al ya piştî salan şûnde vegeirya ser axa xwe bi jinan re di atolya hunera destan de hilberînê dike. Gulfîrazê got piştevaniya jinê mezin dikin û armanca wan avakirina koperatîfa jinê ye.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225053

Çavkanî:JINNEWS



## Gultan Kişanak: Hûn kî ne ku min di darizînin?

Siyasetmedar Gultan Kişanak di doza Kobanê de parastian xwe kir û got: “Hûn hewl didin ji bo propogandaya reş a rejîma otorîter a AKP-MHP’ê qilifek hiqûqî peyda bikin. Hûn kîne ku hûn min darizînin?”

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/gultan-kisanak-hun-ki-ne-ku-min-di-darizinin-43165

Çavkanî:JINHA



# Ji jinên Suweydayê bang: Girtiyan berdin

Jinên ku li Qada Karama ya bajara Suweyda ya Sûriyeyê hatin cem hev, xwestin mafên wan ên herî bingehîn bên bi cih anîn û banga berdana girtiyan kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-jinen-suweydaye-bang-girtiyan-berdin-43161

Çavkanî:JINHA




# Li Îranê xizanî xwendekaran neçar dihêle ku dev ji dibistanê berdin

Li Îranê rêjeya dev ji dibistanê berdana xwendekaran li gor deh salên dawî di asta herî jor de ye. Sedemên sereke jî wek xizanî, polîtîkayên yekparêz ên dewletê ku cudahiyan li ber çavan nagire û nebûna perwerdeya bi zimanê dayikê tê şîrovekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-Irane-xizani-xwendekaran-necar-dihele-ku-dev-ji-dibistane-berdin-43157

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê ji bo destkeftiyên hevpar em piştgiriyê bidin hev’

Hunermenda şanoyê ya Mexribê Bahîa Mortada, da zanîn ku lîstikvanên jin di mijara ragihandina êş û hestên jinan de zêdetir jêhatîne û wiha got: “Divê ji bo destkeftiyên hevpar em piştgiriyê bidin hev.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/dive-ji-bo-destkeftiyen-hevpar-em-pistgiriye-bidin-hev-43155

Çavkanî:JINHA



## ‘Li Tûnisê divê zagona li dijî tundiyê were pêkanîn’

Seroka Komeleya Fanara Yousra Bouafia, bal kişand ku li Tûnisê tundiya li dijî jinê û qetliam her ku diçe zêde dibe, xwest ku zagonên li dijî tundiyê derdikeve were pêkanîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-tunise-dive-zagona-li-diji-tundiye-pekanin-43153

Çavkanî:JINHA



## [‘Hun nikarin têkoşîna azadiya jinê kriminalize bikin’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/hun-nikarin-tekosina-azadiya-jine-kriminalize-bikin-43188)

Rêxistinan bertek nîşanî binçavkirina di navde Dayîkên Aştiyê û seroka Komeleya Demê jinê Dîlek Başalan heyî dan û gotin: “Hun nikarin têkoşîna azadiya jinê kriminalize bikin. Demildest hevalên me berdin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hun-nikarin-tekosina-azadiya-jine-kriminalize-bikin-43188

Çavkanî:JINHA




## Rejîma Îranê 15 meh cezayê girtîgehê da Nergîs Muhammedî

Dadgeha rejîma Îranê li aktîvîst Nergîs Muhammedî ku Xelata Aştiyê ya Nobelê girtibû re 15 meh cezayê girtîgehê birî.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rejima-Irane-15-meh-cezaye-girtigehe-da-nergis-muhammedi-43183

Çavkanî:JINHA



## ‘Jinên xwedî zarok neçar dibin dawî li karê bînin’

Mamosteya pêşdibistanê Hêşû Ehmed diyar kir ku ji bo xwedîkirina zarokan gelek dayik neçar dibin dest ji karê xwe berdin divê malbat û hevjîn alîkariya dayikên ku dixebitin bikin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/jinen-xwedi-zarok-necar-dibin-dawi-li-kare-binin-43177

Çavkanî:JINHA



## Li Yemenê rêjeya tundiya li dijî jinan zêde dibe

Yekîneya Parastina Jinê ya ku li Nexweşxaneya Giştî ya Al-Savra ya bajarê Taîzê hat avakirin, ji jinên rastî tundiyê tên re piştgiriya pêwîst dide

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-yemene-rejeya-tundiya-li-diji-jinan-zede-dibe-43176

Çavkanî:JINHA



## Li Stenbolê gelek jin hatin binçavkirin

Li Stenbolê di serdegirtina gelek malan de gelek jinên ku Dayikên Aştiyê jî di navbera wan de hene hatin binçavkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-stenbole-gelek-jin-hatin-bincavkirin-43175

Çavkanî:JINHA




## Li Tûnisê zarokên keç ji perwerdeyê bêpar in!

Zarokên keç ên Tûnisê tevî ku ji mafê xwe yê perwerdeyê bêpar tên hiştin jî serî li ber biryarên civakê natewînin û ji bo pêşarojeke baş, hînî hunerên destan dibin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-tunise-zaroken-kec-ji-perwerdeye-bepar-in-43174

Çavkanî:JINHA



# [Zubeyde Zumrut: Divê êdî tecrîd bê şikandin, ev vekirî û zelal e](https://jinhaagency.com/ku/rojane/zubeyde-zumrut-dive-edi-tecrid-be-sikandin-ev-vekiri-u-zelal-e-43172)

Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut, diyar kir ku eleqeya gel, jin û dostên gelê Kurd ji kampanyaya bi navê "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" re zêde ye û divê tecrîd bê şikandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zubeyde-zumrut-dive-edi-tecrid-be-sikandin-ev-vekiri-u-zelal-e-43172

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Êzidî: Em ê Êzdîxana xweser ava bikin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-Ezidi-em-e-Ezdixana-xweser-ava-bikin-43170)

Jinên Şengalê 9’emin salvegera Meclîsa Xweser a Şengalê pîroz kirin û diyar kirin ku wê ji herdemê zêdetir kar û xebatên xwe ji bo xweseriya Şengalê bihêztir bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-Ezidi-em-e-Ezdixana-xweser-ava-bikin-43170

Çavkanî:JINHA



## DDB’ê der barê serlêdana Aysel Tugluk biryara ‘binpêkirin tuneye’ da

ENQERE- Dadgeha Destûra Bingehîn (DDB) di serlêdana êrîşa li ser cenazeyê dayika siyasetmedara Kurd Aysel Tuglukk a nexweşa demansê Hatûn Tugluk de biryar da û got "mafê rêzgirtina jiyana taybet" nehatiye binpêkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225183

Çavkanî:JINNEWS





## ÎSÎG: Di 2023’yan de 147 karkerên jin jiyana xwe ji dest dan

STENBOL - Meclisa ÎSÎG’ê rapora xwe ya sala 2023’yan aşkera kir û got di salekê de hezar û 932 karkeran jiyana xwe ji dest dan. Ji karkerên jiyana xwe ji dest dayîn 147 jê jin, 54 jê zarok û 106 jî penaber bûn.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225149

Çavkanî:JINNEWS



## 'Hevserokatî encama têkoşîna li dijî zîhniyeta mêr e'

AMED - Endama PM'a DBP'ê Elîf Turan, a ku derbarê modela hevserokatiyê ya DEM Partiyê û bi nûnertiya wekhev tevlibûna wê ya hilbijaritnê nirxand, diyar kir ku pergala hevserokatiyê encama têkoşîna li dijî zîhniyeta mêr e.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225123

Çavkanî:JINNEWS



# Komeleya Dema Jinê: Em ê dev ji têkoşînê bernedin!

STENBOL - Komeleya Dema Jinê ya tevî seroka wan Dîlek Başalan 17 kes hatin binçavkirin di daxuyaniya xwe de wiha got:"Em li vir dîsa bi awayekî bi hêz îfade dikin ku em ê li dijî siyaseta we ya qirêj dev ji keda xwe, beden, nasname, çand û hebûna xwe bernedin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225228

Çavkanî:JINNEWS



## Li Osloyê dewreya perwerdeyê ji bo jinên kurd hat lidarxistin

NAVENDA NÛÇEYAN - Rêxistina Tevgera Azadî li Osloyê bi hevkariya Akademiya Jineolojiyê dewreyek ya perwerdeya 3 rojan ji bo jinên Başûrê Kurdistanê li dar xist.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225214

Çavkanî:JINNEWS



## Fatêxan Taşli Tunç: Ger tu bi zimanekî din bijî tu tune ye

AMED - Nivîskara kurd Fatêxan Taşli Tunç a ku di fuara pirtûkan de pirtûka xwe ya bi navê 'Kezî' da nasîn, diyar kir ku sê pirtûkên wê yên din ên amade kiriye heye û got: "Ez bangê li jinan dikim ku binivîsin. Jiyana her jinekê bi çîrokên balkêş mijara wêje û helbestê ye."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225195

Çavkanî:JINNEWS



## Saziyên çapemeniyê: Ya tê darizandin ne Dîcle rojnamegerî ye

Rêxistinên pîşeyî yên çapemeniyê, banga beşdarbûna danişîna hevseroka DFG’ê Dîcle Muftuoglu ku dê sibe bê lidarxistin kirin û wiha gotin: “Ya tê darizandin ne Dîcle, rojnamegerî ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/saziyen-capemeniye-ya-te-darizandin-ne-dicle-rojnamegeri-ye-43204

Çavkanî:JINHA




## Jinên Misrê: Divê em li dijî sûcên li Efrînê tên kirin bibin yek

Jinên Misrê diyar kirin ku sûcên dewleta Tirk û çeyetên girêdayî wî yên li dijî jinên Efrînê dikin gihîştine asteke tirsnak û destnîşan kirin ku divê jin li hemberî wan kiryaran bibin yek û bertekên xwe nîşan bidin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-misre-dive-em-li-diji-sucen-li-efrine-ten-kirin-bibin-yek-43199

Çavkanî:JINHA



## Şert û mercên jiyana jinên Suweydayê zivistanê zehmet dibe

Jinan, diyar kirin ji ber qeyrana aborî û qutbûna elektrîkê ya bajarê Suweyda ya Sûriyeyê tê jiyîn, zivistanê şert û mercên jiyana wan roj bi roj xerabtir dibe.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/Sert-u-mercen-jiyana-jinen-suweydaye-zivistane-zehmet-dibe-43193

Çavkanî:JINHA



## Jinên gundê Bûged bi çandiniyê debara xwe dikin

Li gundê Bûged ê girêdayî Koyê zeviyê çandiniyê yê Aske Hesen heye û li gorî werzên berheman, berhemên xwemalî diçînin û piraniya jinên gund bi karên çandiniyê re mijûl dibin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/jinen-gunde-buged-bi-candiniye-debara-xwe-dikin-43192

Çavkanî:JINHA



## Di wergirtina xelatê de navê 71 jinên li Îranê girtî li ser bedena xwe nivîsî

Jina leyîstikvana sînemayê ya Îranî di merasîma wergirtina xelata baştirîn rolê serekî de navê 71 jinên li Îranê girtîne li ser bedena xwe nivîsî.

https://rojnews.news/ku/?p=301145

Çavkanî:ROJNEWS



## Emîne Şenyaşar a emeliyat bû: Dê nobet berdewam bike

RIHA - Emîne Şenyaşar ji ber pirsgirêka xwe ya tenduristiyê ji çavê xwe emeliyat bû. Emîne da zanîn ku dema sax bû dê Nobeta Edaletê ya neçar ma navberê bidê, li ber Wezareta Dadê bidomîne.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225328

Çavkanî:JINNEWS




## Berhemên jinên Rojhilatê Kurdistanê li Başûr dide nasîn

SILÊMANÎ - Jin ji bo li ser lingên xwe bisekinin û dabînkirina jiyana xwe, karên destan çêdikin. Gûna Mihemed jî ji bo piştgirîkirina jinên Rojhilat karên destan li başûrê Kurdistanê di festîvalan de dide nasîn.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225286

Çavkanî:JINNEWS



## Jin 43 roj in ji Nobeta Edaletê re pêşengiyê dikin

AMED - Di çarçoveya pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî' Nobetên Edaletê yên hatibûn destpêkirin didomin. Jinên di Nobetê de ne û jinên ji bo piştgiriyê çûn serdana nobetê banga mezinkirina têkoşînê kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225266

Çavkanî:JINNEWS



## Çalakvana siyasî Firyal Silêman Xalid li Kerkukê hat qetilkirin

Çalakvana siyasî ya ji Rojavayê Kurdistanê Firyal Silêman Xalid di encama êrişa çekdarî de li Kerkukê hate qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-siyasi-firyal-sileman-xalid-li-kerkuke-hat-qetilkirin-43233

Çavkanî:JINHA



## EŞÎK: Divê em Qanûna Medenî biparêzin

EŞÎK'ê, destnîşan kir mafên Qanûna Medenî misoger dike yek in û wiha got: "Em neçarin Qanûna Medenî ya ku ji bo jiyan, ji bo azadî û ji bo wekheviyê rêgaza laiktî di jiyana taybet de garantî dike û jiyanek sekûler biparêzin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/eSIk-dive-em-qanuna-medeni-biparezin-43226

Çavkanî:JINHA



# [Bi ‘Firina Jinê’ ji bo jinan derfetê kar ava dike](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/bi-firina-jine-ji-bo-jinan-derfete-kar-ava-dike-43224)

Janan Hayek a ku ji ber krîza aborî ya li Libnanê tê jiyîn dev jî karê bankayê berdide li bajarokê Bîkfayayê bi vekirina ‘Firina Jinê’ ji gelek jina re derfetê kar ava dike.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/bi-firina-jine-ji-bo-jinan-derfete-kar-ava-dike-43224

Çavkanî:JINHA




# [‘Rojnamevanên jin ji ber siyasetê heyî li dijî gefan bêdeng dimînin’](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/rojnamevanen-jin-ji-ber-siyasete-heyi-li-diji-gefan-bedeng-diminin-43219)

Rojnamevanên jin ên başûrê Kurdistanê diyar kirin ku ji ber rojnamevanên azad ji aliyên partiyên siyasî ve ku ne girêdayî wan in tên tirsandin, li dijî tundî, gef û zextên ku li wan tên kirin bêdeng dimînin û gilî nakin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/rojnamevanen-jin-ji-ber-siyasete-heyi-li-diji-gefan-bedeng-diminin-43219

Çavkanî:JINHA



## Jinên Tûnisê piştgirî dan jinên Xezayê

Jinên Tûnisê yên ku li dijî êrîşên Îsraîlê yên li dijî Xezayê ji bo bi gel re hevgirtin bikin kampanya dan destpêkirin, bang li hemû rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên mirovî kirin û xwestin binpêkirinên li Xezayê bên eşkere kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunise-pistgiri-dan-jinen-xezaye-43218

Çavkanî:JINHA



## Pakistan êrişî Îranê kir: 3 jin û 4 zarokê Beluc jiyana xwe ji dest dan

Pakistan li eyaleta Sîstan-Belucîstanê li gundekî hîn malan bombebaran kir. Rêveberiya Îranê ragihand ku li gund 3 jin û 4 zarok jiyana xwe ji dest dane.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/pakistan-erisi-Irane-kir-3-jin-u-4-zaroke-beluc-jiyana-xwe-ji-dest-dan-43217

Çavkanî:JINHA



## Atolya jinên ciwan ên Mexmûrê hat aktifkirin

Atolyeya jinên ciwan a bi navê Şehîd Avyan Buldan ku di sala 2020’an de hat avakirin, ji bo perwerdekirin û pêşxistina jinên ciwan hat aktîfkirin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/atolya-jinen-ciwan-en-mexmure-hat-aktifkirin-43212

Çavkanî:JINHA



## Li Sakaryayê polîs jin û zarokek qetil kir

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Sakaryayê Îlker Tarik Unal yê peywira komîseriyê dikir, Nesrîn Unal ya pê re di asta destberdanê de bû û keça wê qetil kir, dayika xwe jî birîndar kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225402

Çavkanî:JINNEWS



## Ji bo 10 jinan daxwaza girtinê

STENBOL - Ji jinên ku di 16'ê Çileyê de di serdegirtina malan de bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" hatin binçavkirin, 10 jin bi daxwaza girtinê sewqî dadgeriyê hatin kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225395

Çavkanî:JINNEWS



## Di avakirina civaka ekolojîk de rola jinê û jineolojî

"Divê hevjiyana azad a navbera jin û mêr de bê vakirin û civakîbûna vê bê pêşxistin. Divê têkiliya jin-mêr ya ku bingeha hemû prisgirêkên civakiye, di esasa azadiya jinê de bi awayekî zanistî bê çarserkirin û ev wê hêza esas a civaka demokratîk û ekolojîk jî ava bike. Bêguman jineolojî jî xwedî van taybetiyane ku van derxe holê."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225348

Çavkanî:JINNEWS



## CFWIJ: Di kanûnê de 6 rojnamegerên jin hatin qetilkirin

CFWIJ'ê, rapora xwe ya meha kanûna 2023'yan eşkere kir. Li gorî raporê, li dijî rojnamegerên jin 76 binpêkirin hatin kirin û 6 rojnamegerên jin jî hatin qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/cfwij-di-kanune-de-6-rojnamegeren-jin-hatin-qetilkirin-43245

Çavkanî:JINHA




## Ji bo tevli merasîma cenazeyê bavê xwe bibe ji malbata wê pere hat xwestin

Ji bo Jiyan Ateş a li Girtîgeha Jinan a Sîncanê ya Enqereyê tê girtin û 5 car in înfaza wê te şewitandin, tevlî merasîma cenazeyê bavê xwe bibe, ji malbata wê re hat gotin ku divê 20-30 hezar lîre mesrefê bidin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-tevli-merasima-cenazeye-bave-xwe-bibe-ji-malbata-we-pere-hat-xwestin-43243

Çavkanî:JINHA



## Aktivîstên jin ên Mexribê: Êdî dema zêdekirina destkeftiyan hatiye

Aktîvîstên jin hilbijartina Maxribê ya ji bo serokatiya Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî erênî nirxandin û diyar kirin ku dem hatiye di warê mafên jinan de destkeftî zêdetir bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/aktivisten-jin-en-mexribe-Edi-dema-zedekirina-destkeftiyan-hatiye-43242

Çavkanî:JINHA



## 'Em hewl didin bi rêya hunerê sînoran ji nava xwe rakin'

ŞEHBA - Jinên tevlî 5'emîn Festîvala Mîtan bûn diyar kirin ku bi festîvalên bi vî rengî moralê welatiyên li Şehbayê baştir dibe û wiha gotin:" Bi riya vê yekê em hewl didin ku wekî kurd ji her çar parçeyên welêt li hev kom bibin û van sînorên ku dagirkeran xistine nava me, em bi riya hunera xwe rakin. "

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224957

Çavkavî:JINNEWS



## ‘Divê dewleta Tirk li dadgehên navneteweyî bê darizandin’

Jinên Efrînî yên Şehbayê êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê yên bi darvekirin û girtinê yên li ser jinên Efrînê şermezar kirin, bang li saziyên navneteweyî û rêxistinên jinan kirin û gotin, "Divê dewleta Tirk li dadgehên navneteweyî bê darizandin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-dewleta-tirk-li-dadgehen-navneteweyi-be-darizandin-43135

Çavkanî:JINHA



## Li Şehbayê navenda dermanên xwezayî vebû

ŞEHBA - Cara yekem li kantona Efrîn-Şehbayê navenda dermanên xwezayî ya bi navê Şahmaran hat vekirin. Jinan têkildarî mijarê diyar kirin ku divê gel bi awayekî xwezayî bên dermankirin û got me xwest gel berê xwe bide dermanên xwezayî.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225145

Çavkanî:JINNEWS




## Jineke Efrînî li Hatayê hat kuştin

Li gundê Yolçatı (Akbez) ê girêdayî navçeya Hassa ya bajarê Hatay ê Tirkiyeyê jineke Efrînî ya 77 salî hat kuştin.

https://hawarnews.com/kr/jineke-efrini-li-hataye-hat-kustin

Çavkanî:ANHA



# [Jin bûn sembola berxwedana Efrînê](https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225268)

NAVENDA NÛÇEYAN - Rihê berxwedanê ya li Kobanê ji Efrînê re wek mîrateyek ma û tevî êrişên mezin berxwedanek bi heybet hat meşandin. Li Efrînê jin bûn sembola berxwedanê.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225268

Çavkanî:JINNEWS




# Ji bo jinên ji Serêkaniyê perwerdeya tenduristî tê dayîn

Weqfa Jinên Azad, bi xebatên xwe yên perwerdehiyê hem hişmendî dide jinên li Kampa Waşokanî û hem jî bo piştgirîkirina jêhatibûnên wan ên pîşeyî derfetên kar misoger dike. Jinan di qursên tenduristiyê de, fêrî alîkariya lezgîn dibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-jinen-ji-serekaniye-perwerdeya-tenduristi-te-dayin-43220

Çavkanî:JINHA



# Bajarê ku jinan ava kir bû navenda talanê

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Efrînê ku hema hema hemû sûcên şer hatin jiyîn û di vî alî de mînaka wê li cîhanê pir kêm e. Li Efrinê gelan sazbûna demokratîk azadîxwaz a jinê ava kir. Ligel vê polîtîkayên zext, asîmîlasyon, destdirêjî, talan û koçberkirina kurdan pêk hat. Tevî hemû sûcên şer, ji araneya navneteweyî ji bilî belgekirinê tu tiştek nehat kirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/225352

Çavkanî:JINNEWS



Kongira Star

20/1/2024